Pêzanîn ên li dor Vîrus a Korona

1. Çawa mirov dikare bi Vîrusa Korona bikeve?

Vîrus ji mirov bo mirov î tê veguhestin. Bo nimûne li dema kuxînê, peyvînê an dema destê xwe died yikî din çêdibe.

2. Çawa mirov nas dike, ku vîrus pê re heye?

Eger vîrus a korona bi mirov î re hebe, bo nimûne kuxuk tê yê, bêhvil diherrike, gewrî dixure û ta digire. Bi hinek mirovan re zikêş jî çêdibe. Hinek nexweş rewşa wan xerabtir ji a hin din dibe; bi wan re astengiya bêhinê û kûlbûna kezebê çêdibe.

Eger vîrus a korona bi mirovî re hebe, dikare 14 rojan berdewam bike, tu ku nîşanên nexweşiyê dest pê bikin bêne der.

3. Çima virus a korona metirsîdar e?

Li nik bêhtirîn ji mirovan ev nexweşî a vîrus a korona bi hêsanî derbas dibe. 15 ji sedî, yên vê nexweşiyê ew vegirtiye zor e: ew tûşî astengiyên bihinçikandinê û kulbûna kezebê tê.
Yên bi vê virus ê ta niha mirine, beriya her tiştî ew mirovên bi temen mezin in û mirov ên, ku berya niha nexweş bûn.

4. Ez dikarim çi bikim, dema nîşanên nexweşiyê li min bêne der?

Her kes ê ê ta, kuxuk an bêhinçikîn pê re hebe û li taxekê bijî, ku tê de mirov hene, vîrus a korona vegirtibe wan, pêdiviye telefona bijîjkekî/ê bikin û civanekî jê werbigirin.

Her kes ê ê ta, kuxuk an bêhinçikîn pê re hebe, pêdivî danûstendin û têkiliya wî kêm bi mirov ên din re hebe. Xwe bi kêmanî ji 1,5 ta bi 2 mitran xwe ji mirovan dûr bikin.

Eger bibe, li mala xwe bimînin an di odeya xwe de. Kuxuîn û pişikandin di enîşka xwe de bikin, an jî di destmalekê de, ya ku êdî pêdivî ye hun yek ser wê bavêjî setila gilêşê. Pirê caran pêdivî ye bi başî hun destên xwe bişon (bi taybetî di peyî çûna we ya destavê û her wisa jî, pêdivî ye beriya hun xwarinê amade bikin).

5. Ez dikarim çi bikim, eger min têkilî bi mirovekî hebe, ku bi Vîrus hatibe vegirtin?

Eger we bi xwe têkiliyeke kesayetî bi wî mirovî re hebe, yê vîrus a korona pê re heyî, telefona bijîjk an Nivîsgeha Tendurustiyê (Gesundheitsamt) ya li cihê mana we bikin, û ji wan re bibêjin. Dibe wisa were, ku xet a telefonê mijûl be, dema gelek mirov bi hev re û di demekê de telefon bidin. Di vir de, ji kerema xwe telefona wezareta elmanî vo kar û barê Tendurustiyê li ser vê Nr: 030 346 465 100 bikin. Şêwirmendî tenê bi elmanî ye.

Eger hun li cihê vehewandina wergirtina penabertiyê bin, an jî di kampeke hevbeş de dijîn, pêzanîn bi lez ji berpirsên kampê an jî karmendê tê de werbigirin. Ji kerema xwe jî bo nimûne dibistan, dibistana ziman, a fêrbûn pîşeyî- an cihê kar î pê agahdar bikin.